



SKINNVOTTEN

et eventyr fra Ukraina

LEPIKÊ ÇERM

Çîrokek ji Ûkrayna

Rojek ji rojan zilamekî pîr hebû.

Rojeke sar a zivistanê zilamê pîr bi kuçikê xwe re di
nav daristanê re derbas dibû.

Det var en gang en gammel mann.

En kald vinterdag gikk han tur med hunden sin gjennom skogen.



Zilamê pîr ji nişkê ve kitekî lepikê xwe li nav berfê winda kir.
Haya wî ji ketina lepikê wî tunebû û rêya xwe dewam kir.

Plutselig mistet den gamle mannen den ene votten sin i snøen.
Han gikk videre uten å merke at han hadde mistet votten.



Piştî nîvro mişkek bi lezgînî hat xwe kir di lepik de û bû
çîzçîza wî:

- Ev der dê îşev mala min be.

Utpå ettermiddagen kom en mus pilende.

Den smatt inn i votten og pep:

- Dette skal være huset mitt i natt.



kurdisk kurmanji / norsk bokmål

Piştî demekê beqek bi qevastin li ber lepik sekinî. Beq pirsî:

- Ew kî ye di vî lepikê de dijî?
- Mişkê Guhbel. Ma tu kî yî?
- Beqê Lingdirêj. Gelo ez dikarim bi te re bijîm?
- Belê, kerem bike were hundir.

Etter en stund kom det en liten frosk hoppende bort til votten. Frosken spurte:

- Hvem er det som bor i denne votten her?
- Pilemus Silkehår. Og hvem er du?
- Friskefrosk Langelår. Kan jeg få bo sammen med deg?
- Ja da, bare kom inn.



Hjem, kjære hjem

Berêvarkî kîvroşkek ji wê ve hat, li pêşîya lepik sekinî û pirsî:

- Gelo ew kî ne di vî lepikî de dijîn?

- Mişkê Guhbel û Beqê Lingdirêj, lê tu kî yî?

- Ez Kîvroşka Dinantevş im. Gelo ez jî dikarim bi we re bijîm?

- Belê, kerem bike were hundir.

Da sola holdt på å gå ned, kom det en hare hoppende.

Den stanset foran votten og spurte:

- Hvem er det som bor i denne votten her?

- Pilemus Silkehår og Friskefrosk Langelår, og hvem er du?

- Jeg er Haremann Hopsadans, får jeg lov å bo sammen med dere?

- Ja da, kom inn.



Hjem kjære hjem

Êdî sê ajal di lepik de dijîyan û hindurê lepik gelekê germ bûbû. Êvarî rovîkek bi dizîka ve hat. Li ber lepik sekinî û pirsî:

- Gelo ew kî ne di vî lepikê de dijîn?
- Mişkê Guhbel, Beqê Lingdirêj û Kîvroşka Dinantevş. Tu kî yî?
- Ez Rovîyê Dûvserspî me. Gelo ez jî dikarim bi we re bijîm?
- Belê, kerem bike were hundir.

Nå var det tre dyr som bodde i votten, og det ble veldig varmt. Utpå kvelden kom en rev luskende.

Den stanset ved votten og spurte:

- Hvem er det som bor i denne votten her?
- Pilemus Silkehår og Friskefrosk Langelår og Haremann Hopsadans. Hvem er du?
- Jeg er Revemor Silkesvans. Kan jeg få bo sammen med dere?
- Ja da, bare kom inn.



Hjem, kjære hjem

Êdî çar ajal di lepik de diman û ji xwe re li daristanê dinêrîn. Gurek ji nişka ve di nav berfê de hat. Gur li ber lepik sekinî û pirsî:

- Ew kî ne di vî lepikê de dijîn?

- Mişkê Guhbel, Beqê Lingdirêj, Kîvroşka Dinantevş û Rovîyê Dûvserspî li vir dijîn, lê tu kî yî?

- Ez Gurê Lotikvan im. Bihêlin ez jî li ba we bijîm.

- Belê, kerem bike were hundir.

Gur xwe di nav wan re kir û kete hundir. Êdî di lepik de pênc ajal diman.

Nå satt det fire dyr i votten og tittet ut i skogen. Plutselig kom en ulv labbene gjennom snøen. Ulven stanset ved votten og spurte:

- Hvem er det som bor her?

- Det er Pilemus Silkehår, Friskefrosk Langelår, Haremann Hopsadans og Revemor Silkesvans, men hvem er du?

- Jeg er Ulven Aldrimett. La meg få bo hos dere.

- Ja da, kom inn.

Ulven smøg seg inn i votten, og nå var de fem dyr der inne.



Hjem kjære hjem

Piştî demekê berazekî berî di wir re derbas

bû. Beraz sekinî û pirsî:

- Ew kî ne di vî lepikî de dijîn?

- Mişkê Guhbel, Beqê Lingdirêj, Kîvroşka

Dinantevş, Rovîyê Dûvserspî û Gurê Lotikvan,

lê tu kî yî?

- Ez Berazê Boz im. Gelo ez jî nikarimn bi we

re bijîm?

- Ger tu zêde ne mezin bî, tu dikarî.

- Qet xemê nexwin, ez ê xwe piçûk bikim.

- Nexwe kerem bike were hundir.

Etter en stund kom det et villsvin tuslende forbi.

Det stanset og spurte:

- Hvem bor i denne votten?

- Pilemus Silkehår, Friskefrosk Langelår, Haremann

Hopsadans, Revemor Silkesvans og Ulven Aldrimett,
men hvem er du?

- Jeg er Villsvinet Trynebrett. Kan ikke jeg også få bo i
votten?

- Hvis du ikke er for tykk, så.

- Å nei da, jeg skal gjøre meg så liten jeg kan.

- Ja, kom bare inn.



Êdî şeş ajal di lepik de diman û rêya wan gelekî teng
bû. Hema bêje êdî wan nikarîbûn bilivin. Paşê
qirçênî ji qirşikan hat û hirçek derket.

- Ew kî ne di vî lepikî de dijîn? hirçî pirsî.
- Mişkê Guhbel, Beqê Lingdirêj, Kîvroşka
Dinantevş, Rovîyê Dûvserspî, Gurê Lotikvan û
Berazê Boz, gelo tu kî yî?
- Ez Hirçê Sermezin im. Gelo ez dikarim bi we re
bijîm?
- Nexêr, em nikarin te bixin hundir, cihê me nîne.
- Belê belê cih heye, hema hinekî xwe bi serhev
de bidin dê cih vebe.

Nå satt det seks dyr i votten, og det var veldig trangt, de
kunne nesten ikke røre seg.

Da knakk det i en kvist, og så kom en bjørn labbene.

- Hvem bor i denne votten her? brummet bjørnen.

- Pilemus Silkehår, Friskefrosk Langelår, Haremann
Hopsadans, Revemor Silkesvans, Ulven Aldrimett og
Villsvinet Trynebrett, men hvem er du?

- Jeg er Bamsefar Labbdiger, kan jeg få bo sammen med
dere?

- Vi kan ikke la deg komme inn, vi har ingen plass.

- Å jo da, trykk dere sammen, så går det nok.



Hjem, kjære hjem

Hirçî bixwe rêya xwe di lepik vekir. Ji ber ku êdî heft
ajal di lepik de diman, kêlîyên lepik berdan.

Og så krøp bjørnen inn i votten, det knaket i alle sømmene, for nå var
det syv dyr som bodde der.

Hjem, kjære hjem



Di vê navberê de zîlamê pîr ferq kir ku lepîkekê xwe wînda kiriye. Ji ber vê yekê ew û kûçîkê xwe di dewsa xwe de vegehiyan da ku li lepîk bigerin. Kûçîk li pêş dibezî û dît ku lepîk di nav berfê de dilivî. Mîna ku lepîk dijîya.

I mellomtiden oppdaget den gamle mannen at han hadde mistet votten sin. Derfor gikk han og hunden tilbake for å lete etter den. Hunden løp foran, og fikk se votten som rørte seg i snøen, akkurat som om den var levende.



Kûçik dest bi ewtewtê kir: «eww, eww, eww» Hemû ajal ji nav
lepik derketin û di nav daristanê de bazdan.

Da begynte hunden å bjeffe: «Voff, voff, voff.»

Alle dyrene sprang ut av votten og ble borte i skogen.



kurdisk kurmanji / norsk bokmål

Hjem, kjeere hjem

Zilamê pîr rahişt lepik û xist destê xwe. Wî fam nedikir
çima hundirê lepik wisa germ û xweş e. Ji ber ku ev
demeke dirêj bû lepik di nav berfê de mabû.

Den gamle mannen tok på seg votten sin, og han kunne ikke skjønne at den
var så god og varm inni, når den hadde ligget i snøen så lenge.



kurdisk kurmanji / norsk bokmål

Çîroka me li vir qedîya, rehmêt li dê
û bavê mirîyan.

Snipp snapp snute, eventyret er ute.



Eventyret «Skinsvotten» kommer fra Ukraina og er gjendiktet av Alf Prøysen.



Tekst og illustrasjoner: tilrettelagt og oversatt av
Nasjonalt senter for flerkulturell opplæring